# Partîyek mafxwaz yan nasnamexwaz?

»»» R:10



# Dema wê ye ku em bi hev re bifikirin

»»» R:4

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (452) 22-08-2023Buha (1000) Tûmen

# Kodên faşîzmê

»»» R:5

# 78sal xebat û berxwe-dan

»»» R:8

# Yadek pîroz

Her li berê hatiye gotin ku ger di cihekê yan di nava civakekê de yan neteweyekê yan heta di nava malbatekê de yekîtî û tifaq hebe, ger yekrêzî hebe, hêz û şiyan jî heye û tu dujminek nikare zeferê ji vê malbatê û netewê û civakê bibe.

Hewceye ku amaje bi berewajiyê vê yekê jî anku netifaqî û jev weqetiyan nebûna yekîtiyê jî bê kirin ku ger tifaq û yekîtî di nava netewe yan civak û malbatekê de tunebe, di encamê de dujminan û neyarên wan karîne gelek bi sanahî wan rastî şikest û windahiyê bikin.

Mixabin di dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd de, hindî Kurdan ji destê hev xisar dîtinî û bi dujminatiya hevdu ve mijûl bûnî, hind ji dest dujmin û dagîrkerên Kurdistanê ve şikest nexwarine.

Lewra ez bawerim êdî Kurdan she bi vê ezmûna tehl û xisara li vê derheqê de kiribin û hewceye derbasbûyî bo xwe bikine waneya jê fêrbûnê.

Her wekî her aliyek dizane 17 salan berya niha bi sedemê hin pirskirêkên navxweyî, jev weqetiyanek di nava refên PDKî de çêbû, ger em bixwazin bas ji xisarên vê bikin û ji nû ve xwe rexne bikin, renge îro di cihde nebe, lê gelek zû piştî jev weqetiyanê herdu baskên



Hizba Demokrat she bi şaşî û xisarên vê weqetiyanê kirin, lewra deryên diyalogê vekirin û ji bona jev nêzîkbûnê û di encamê de yekgirtina xwe kevtne gengeşê û heya roja 30 yê Gelawêja sala derbasbûyî di merasimeke jêhatî de mizginiya yekbûna xwe dane gelê Kurd û endam û alîgirên xwe û malbatên serbilind ên Şehîdan û dilê evîndarên rêbaza xwe xweş kirin û dujminê xwe jî kor û posîde û bê hêvî kirin.

Hizba Demokrat ku ev 78 sal in pêşengatiya xebateke berfireh a netewî li Rojhilatê Kurdistanê de dike û hertim cihê hêviya gel bûye û xelkê Kurdistanê serkevtinên vê Hizbê bi yê xwe zanîne û rojên tehl û nexweşî û xisarên vê jî bi yên xwe zanîne, lewra di demekê de ku gelê me bi jev weqetiyana Hizba xwe dilgiran û nîgeran bûn, di 30yê Gelawêja sala borî de jî dilxweş û şad bûn.

Bê guman Hizba yekgirtî ya Demokrat gelek bi bandortir bû. Ev xelkê bi curekê xwe alîgirê yek ji aliyên Demokrat dizanîn, piştî yekgirtinê êdî her hemî xwe alîgirê yek hizbê dizanin ku ev jî Hizba Demokrat e.

Mînaka vê yekê jî her kesî û dost û dujminan ji dilxweşiya xelkê Kurdistanê de dîtin ku mizginiya yekbûnê ji Hizba xwe guhdarî kirin.

Hizba Demokrat piştî vê yekgirtinê di çalakî û kiryar û xebat û siyaseta xwe de bêguman serkevtîtir bûye, çi di asta dîplomasiya navnetewî de, çi li hember dujmin de, çi bandora wê li ser xebata azadîxwaziya xelkê welatperwer ê Kurdistanê de. Renge mînaka herî berçav a vê jî em dema şoreşa Jîna yê de bibînin, di cihê xwe deye ku xuya bû.

Hizba Demokrat cihê hêvya gelê xwe, niha bi yekîtiya xwe, hêza mezin a serhev ya xwe, ji heçî demê derbasbûyî zêdetir bihêz e, li ser piyane, bawer bi xwe ye û li ser xebata li pêxema bi dest ve anîna maf û azadiyên gelê xwe jî, ji heçî demê qahîmtir û micid û mukum di meydana xebatê de rawestiya ye.

Di dawiyê de hewceye ku bi vê hilkevtê ciwantirîn pîrozbahiyên xwe pêşkêşî hemî rêvîngên rêbaza Demokrat bikin û bila niha pêde her yêk ji wan xwe li hember parastina yekîtî û yekrêziya Hizba xwe, xwe berpirsyar bizanin û bi hemî şiyana xwe biparêzên.

# Peyama Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat bi hilkefta 78 saliya avakirina Hizba Demokrat û salvegera yekgirtina refên Hizbê

**Xelkê Têkoşer ên Kuridstanê!**

**Endam û alîgirên Hizba Demokrat!**

**Malbatên serbilind ên şehîdan û girtiyên siyasî!**

25ê Gelawêjê, salvegera avakirina Komeleya Jiyaneweya Kurd (J K)ê ye ku piştî sê salan ji rêkxistinek nihênî ve bû bi rêkxistinek eşkere ya siyasî û navê wê jî bi Hizba Demokrat a Kurdistanê hate guherîn. 25ê Gelawêja îsal 81 sal bi ser Komeleya Jêkaf û 78 sal bi ser ragihandina Hizba Demokrat a Kurditanê ve derbas dibe.

Destpêkê em bi vê minasibetê silavan dişînin bo yad û navên damezrînerên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, berî her tiştî damezrênerên Jêkafê, Pêşewa Qazî Mihemed (damezrênerê Hizba Demokrat), şehîdên nêzîkî heşt dehik xebat û devbernedan ji vê hizbê, hemû têkoşerên vê rêbazê û herwisa endamên hizbê, tev tex û qatên civaka Kurdistanê ku bi cangorîtiyê û girtina erk bi stuyê xwe, bi awayekî bêwestan piştevanî ji xebata Hizba Demokrat kirine.

Em bi vê minasibetê pîrozbahiyê dibêjine malbatên şehîdan, malbatên pêşmerge û girtiyên siyasî ku bi berxwedanî û mana wan di meydanê de û hest bi berpirsyariya xwe, hander û piştevanê Hizba Demokrat in, da ku bi rijdî ve ji hemû demê li çepera xebat û têkoşîna bo bidestveanîna mafên netewayetiya gelê Kurd di Îranê de berdewam be.

Hevalan û hogirên xebata Kurd li Rojhilatê Kurdistanê!

Bi damezrandina Hizba Demokrat qonaxeke nû li têkoşîna siyasî ya Kurd li Îranê li pêxema bidestxistina mafê xwe yên neteweyî destpê kir. Piştî vê ku Hizba Demokrat hate avakirin di nava çend mehan de, karî bi ragihandina Komara Kurdistanê kevirê bingehîn ê yekem desthilata siyasî ya modern û demokratîka Kurdî danê.

Destkevt û mîratên me`inewî yên Komarê wek gotara neteweyî û mafê diyarîkirina çarenivîs û nasnameya serbixwe, danîna ala û sirûda netewî û hêza pêşmerge wek spaha niştimanî, bûn bi xalguherîna xebata netewî ya Kurd û bandorek mezin li ser tevgera siyasiya Kurd danî ku piştî 78 salan, îlhamderê xebata rizgarîxwaziya Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê ye.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê di heyama temenê xwe de, gelek qonaxên dijwar derbas kiriye.

Ev Hizbe ne bi serkevtinan ji xwe derçûye û ne jî di rewşên krîzê de hêviya xwe ji dest daye. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di dîroka 34 sal xebat li dijî rejîma Paşayetî û 45 sal desthilata Komara Îslamî, ne tenê alahilgirê xwest û daxwaziyên gelê Kurd li Îranê bûye, belkî hêza sereke û here diyar a meydana xebata li dijî wê rejîmê jî bûye û niha jî herwisa bi îrade û baweriyeke qahîm ve ji xebat û têkoşîna bo bidestanîna maf û armancên netewî yên Kurd li Îranê berdewam e.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê di pêwendî digel parçeyên din ên Kurdistanê hertim bi hestên berpirsayetî ve tevgeriyaye û di hemû demekê de piştgiriya xebat û hereketa siyasî ya Kurd li parçeyên din ên Kurdistanê kiriye. Siyaseta giştî ya Hizba Demokrat hevpêwendiya netewî digel hizb û aliyên din ên siyasî yên hemû parçeyên Kurdistanê li ser bingeha serbixweyiya biryardan û destêwerdan nekirin di karûbarê siyayî yên yektir de bûye.

**Civata xelkê Kurdistanê!**

25ê Gelawêja îsal ji salvegera damezrandina hizbê di salên borî de taybettir e, ev jî vedigere li ser yekgirtina malbata mezin a Hizba Demokrat. Herdu aliyên demokrat di 30ê Gelawêja sala borî de, piştî 16 salan ji hev veqetan, bi girîngîdan bi tekezî, peyam û pêşniyarên berdewam ên xelkê Kurdistanê ku Hibza Demokrat emanet û dahata xebata xelkê Rojhilatê Kurdistanê ye û nabe êdî ji vê yekê zêdetir bi du parçeyî û jihev veqetîn bimînin, herwiha bi balkişandin li ser pêwîstiya yekxistina wizeya tekoşîna Hizba Demokrat ji bo veguhastina derfetên li pêşiyê û dabînkirina destkevtên zêdetir ji bo tevgera siyasî ya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, refên xwe yek xistin.

Her wek dihate çavnihêrkirin jî, yekgirtina Hizba Demokrat bû destpêka qonaxeke nû ya xebata vê hizbê li dijî Komara Îslamî ya Îranê û bû faktereke bihêz ji bo bandordarbûna tevgera neteweyî ya Kurd ne tenê her li Rojhilatê Kurdistanê, lê belê di asta Îranê de jî. Wek çawa me di şoreşa Jînayê de jî dît, ku civata xelkê Kurdistanê di çi astekê de baweriya xwe bi Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê nîşan dan û herwisa ew bandore bû sedema tolestandina Komara Îslamî ya Îranê.




Hêşta kêmtir ji mehekê ji yekgirtina Hizba Demokrat derbas nebibû, ku şoreşa Jînayê ji Kurdistanê ve hate destpêkirin û tev Îranê li xwe girt. Komara Îslamî ya Îranê ku ji aliyekê ve bi yekrêziya Hizba Demokrat tûre bibû û ronahiya navê hizb, piştevaniya xelkê ji hizbê û derketina dirûşmên wek “Qasmlo rêya te berdewam e” hindeyê din rûreş û hêrs kiribû; Herwiha dema ku şoreş û serhildana li Kurdistanê weke îlhama serhildana bajar û herêmên din ên welat didît, careke din jehra xwe rijande ser tevgera siyasî ya Kurd, Hizba Demokrat û xelkê Kurdistanê. Rêjîmê li navxweya Kurdistanê bi afirandina tawan û karesatên mirovî û bi êrîşa dronî û mûşekbarana baregehên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê û hêzên siyasiyên din ên Kurdistanê yên dijberê rejîmê li kûrahiya axa Herêma Kurdistanê, nîşan da ku ji bo dijayetîkirin digel hereketa siyasî ya Kurd û tepeserkirina mafên rewa yên Kurdan ti sînor û astengiyek exlaqî û yasayî nas nake.

Niha jî, ger çi rêberên rejîmê li ser wê baweriyê ne ku bi tepeserkirina xwînrêjî û hovane ya şoreşa Jînayê, bi zalkirina keşa serkut û girtina bi dehan hezar ji xwenîşanderan û sepandina hukmên demdirêj û heta îdamê û bidarvekirina bilez a zêdetir ji 10 kesan ji wan û heta bidarvekirina jêzdetir ji 700 girtiyên din di sala borî de, hereketa nerazîbûnê ya xelkê sir kiriye, lê em hemû dizanin ku rewşa niha ya şoreşa gelên Îranê agirekî di bin axê de ye û aloziya aramiya berî bahoza niha, benda çexmaxekê ye.

Bûyerên sala derbasbûyî, hêzên siyasî yên Kurdistan û Îranî xistine ber ceribandineke hestiyar a dîrokî û çarenivîssaz. Peyama xelkê zelal e û di pratîkê de jî îspat kirine û amade ne her nirxek din ji bo bidin. Ew ji tevahiya rejîma Komara Îslamî ya Îranê ku ti rewatiyek li cem wan nemaye û bi çavkaniya hemû krîz û bêbextiyên xwe yên civakî dihesibînin, derbas bûne.

Ev yeka jî erk û berpirsiyariyê dixe ser milê hêzên siyasî yên dijberê rejîmê ku bi pêkanîna eniyeke seranserî ya xebatê û ragihandina alternatîva Komara Îslamî ber bi pêçîna yekcarî ya vê Komarê ve herin. Xelkê Kurdistan û Îranê ku di sed salên borî de du rejîmên siyasî yên navendgera, serkutkar, dîktatoriya paşayetî û olî dîtine, daxwaza sîstemeke siyasî ya komarî, demokratîk û sekolar dikin. Eşkere ye ku xelkê Kurdistanê jî ku di sedeyeke borî de çend qat tama bêbeşî ji mafên medenî û siyasî, cudatîdanîn û perawzêxistinî dîtine, û her şêwe daxwaziyek rewa û berheq a wan bi agir û hesin û kuştar bersv hatiye dan, bi rohnî behsa çendî û çawahiya mafên xwe û cih û pêgeha civaka Kurdistanê di Îrana paşerojê de bikin.

Tevgera siyasî ya Kurd bi taybet Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bi ezmûna nêzî 8 dehik xebat di pêxema demokrasî bo Îran û dabînbûna mafên netewayetî yên Kurd li Îranê, li ser wê bawerê ye li hewlên dariştin û avakirina Îrana paşerojê divê hem rastiyên civaka vî welatî bêne berçavgirtin û hem bi balkişandin li ser ezmûn û lêkevtên sedeyek nîzama siyasî ya dîktatorî li Îranê, divê rê neyê dan ku rejîmên serberedayî li vî welatî bêne serkar.

Îran welatek zêde netewe, zêde ol û pêkhatî ji cur bi curên din e ku pêwîst e di pêxema mana vê cugrafiyaya siyasî de mafê wek yek a tev pêkhateyên vî welatî bi fermî bê nasandin

Dom R:3

Doma R:2

û bi dest ve bên. Li cem Hizba Demokrta a Kurdistanê wisa ye ku desthilatek di şêweya komara parlemanî li ser bingehên demokrasî, fedralîzm û sekolarîzm dikare bidestxistina mafê zêdeyiyên Îranê be û ji bo vê armancê jî hewce ye em hemû bi vêdebirina nakokî û pêdagirî li ser hevbeşiyan hewl ji bo pêkanîna eniyeke demokratiyek giştgîr di asta welat de bo derbasbûn ji Komara Îslamî ya Îranê û çêkirina Îraneke paşerojê bidin.

Xelkê mafxwaz ên Kurdistan!

Di heyama borî de mencek nû ji gefên êrîşên Komara Îslamî li zimanê karbidestên siyasî û fermandên leşkerî yên rejîm ve li dijî Hibza Demokrat dubare dibin. Herwisa rejîm di hewlê de ye ku dîplomasî û givaşên xwe bo ser hikûmeta navendî ya Îraqê û Herêma Kurdistanê, wisa nîşan bide ku hebûna Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê û aliyên din ên dijberî wê di axa herêmê de metirsî li ser rejîmê çê kirine. Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê di vê derfetê de cardin tekeziyê li ser siyasetên xwe yên dirust li pêxema xebat bo bidestveanîna mafên netewî yên gelê Kurd û hemû pêkhateyên netewî yên Îranê dike.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ku di heşt dehikên derbasbûyî de xebatek berdewam di hemû şêwazên xwe de bo dakokî û bidestxistina maf û azadiyên xelkê Kurdistanê kiriye û di van dehan salan de bi dehan rêber û bi hezaran pêşmergeyên vê di vê pêxemê de canê xwe gorî kirine, carek din jî tekeziyê li ser wê yekê dike ku pirsa Kurd li Îranê rêçareya leşkerî nîne.

Pirsya Kurd li Îranê pirsya zêdetir ji deh milyon kes e ku mafên mirovî ên xwe nas dike û daxwaza wan dike û ji xebat bo bidestveanîna wan berdewam e; Herwisa ne serkut û kuştar û ne teror û mûşekbaran nekariye pê bide sekînandin û nikare jî rawestîne.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê tevî pîrozbahiya hatina 25ê Gelawêjê, salvegera avakirina Hizba Demokrat û 30ê Gelawêjê, yekgirtina refên xwe û bi tekezîkirin li ser yekgirtî û yekîtiya teşkîlatî ya hizbê, peymanê nû dike ku bi piştevaniya hemûalî ya xelkê Kurdistanê heta rizgarî û bidestveanîna mafên netewayetî yên gelê Kurd li Îranê dê li ser xebata xwe berdewam dibe

**Silav li avakerên Komeleya Jêkaf û Hizba Demokrat!**
**Silav li evîndarên Hizba Demokrat**

**Silav li îradeya hevbeş a seranserî ji bo herifîna Komara Îslamî**

**Serkeve hereketa Kurd di pêxema rizgarî û dabînbûna mafên netewayetî de**

**Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberî**

**24ê Gelawêja 1402 a Rojî**

# Peyama birêz Mistefa Hicrî bi hilkefta 25ê Gelawêjê

**Birêz Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya PDKÎ bi hilkefta 78emîn salvegera damezrandina Hizba Demokrat a Kurdistanê peyamek belav kir.**



**Deqa peyamê wiha ye:**

25ê Gelawêjê, roja avakirina Hizba Demokrat a Kurdistanê ye. Destpêkê ev roje li tev rivîng û evîndarên riya rizgarî û azadiya Kurdistanê pîroz be, li hemû wan şoreşvanên bi emeg pîroz be ku di refên xebata dehan sale ya vê Hizbê de canê xwe gorî kirine û nifş li pey nifş çepera xebata pêşmergane avedan kirine.

Ez bi vê boneyê bi pêwîst dibînim ku van xalan bi bîr bînim;

- Hizba Demokrat li ser bingeha xwedîderkevtin û bi encamgihandina pirsa netewî û doza nîştimanî hatiye avakirin, heta niha jî hilgirê heman nirxan e û di vê pêxemê de jî xebatê dike.

- Serhildana Hizba Demokrat encama geşekirina hizra netewî û xwasta civaka Kurdistanê bûye û herdem ji wê songehê ve xwe pênase kiriye. Bûye pîvana hemû siyasetên rastî û cihê civaka Kurdistanê.

- Sedema sereke ya zîndîmana 25ê Gelawêjê wek remzek netewî di yad û bîra giştiya Kurdistaniyan de, tekeziya vê hizbê bûye li ser rêbaza netewî û hêla nîştimanî. Bi berxwedaniya dîrokî ya di vî warî de, têkoşîna xwe didomîne.

- 25ê Gelawêjê xala werçerxanê ye û nîştimanperwer biryarê didin ku refên xwe rêk bixin da ku bi yekgirtî, pirsa netewî bikin bi rêbazek hertimî. Niha jî ev rêbaze, take rêya serkevtin û bidestveanîna çarenivîsa nîştimana me ye.

- Avakirina Hizba Demokrat, çûn di nav qonaxa tevgerek serdemiyane de ji bo berxwedana nîştimanî li hember dagîrker bû. Ji îro ve jî Hizba Demokrat pal daye bi heman tevegerê ku mînaka berçav a vê tevgera “Jin Jiyan Azadî” ye û armanca vê serwerî, wekhevî, dadperweriya civakî, kiramet û rizgariya mirovan di bindestiyê de ye.

- 25ê Gelawêjê nûneratiya îradeya neteweyekê dike. Heman îrade ku xortên Kurdistanê li çiya û bajar wêne dike. Wêneyek ku pêşmerge amade nebû dev ji îradeya xwe berde û xebatkarên bajar jî rojane rijd û pêdagir in, û îradeya xwe nîşanî dagirkeran didin.

Di dawiyê de ez dixwazim bêjim ku 25ê Gelawêjê di dîroka tevgera netewî ya Kurdistanê de xaleke werçerxê ye. Werçerxanek ku arasteya birêxistinkirina civaka Kurdistanê ji bo bidestxistina mafê serweriyê guhert û di heman demê de Kurdistanîbûn kir bi nasnameyekî hertimî û gotareke neteweyî.

**Mistefa Hicrî**

**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya PDKÎ**

**24ê Gelawêja 1402 a Rojî**

# Dema wê ye ku em bi hev re bifikirin



N: Dr.Mecîd Heqî

Tu netewe û tevger di şevekê de çênabe. Hemû kesên ku “îdiaya” têkoşîna rizgariya netewî dikin û her kesên ku xwe “şoreşger” dihesibînin, armanca sereke rizgariya netewî û gihandina armancên mirovî yên neteweya Kurd in. Di vî warî de tu raman ji ya din “pîroztir” û rasttir nîne.

Rojhilatê Kurdistanê bi salane tûşî qeyrana siyasî û serkirdayetî bûye. Kûrahiya van qeyranan dema ku di mijarên siyasî yên di rojevê de cudahiyek hebe derdikeve holê. Wê demê dijberê sereke wê ji bîr bibe û Kurd û tevgera siyasî ya Kurd bikevin nava canê hev.

Destpêka şoreşa “Jin, Jiyan û Azadî” ya ku bi awayekî lihevhatî hat meşandin, hêviyek mezin da hemû gelê Kurd. Kurdistan ji bo hemû parçeyên Îranê bû sembola yekîtiyê û çavkaniya hêz û îlhamê. Partiyên perçebûyî yên Kurdistanê bi lez û bez yekitiya partiyan ragihandin û diyalogeke neteweyî pêş ket.

Lê mixabin heyva hingivîna yekitiya kurdan dirêj nekişand. Atmosfera bêbaweriyê zû êrişî “şikandina” yekrêziya Kurdistanê kir û bi destpêkirina danûstandinan û ragihandina menşûra “Mahsa” an George Twon, dûrahiya di navbera hêzên ku Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanî yên Kurdistana Îranê pêk dianîn, hat rakirin. Weke ku projeya muxalefeta navendperest ji bo cudabûnê û hilweşandina dîwarên yekitiya Kurdan armanc kiriye. Kulîlkek ku ji hêla Menşûra Mahsa ve di atmosfera medyaya navendîparêz a bi zimanê farisî de hatî çêkirin, hewl da ku wî wekî alternatîfa yekane bihesibîne, û di demek kurt de, bi heman leza damezrandina gav bi gav Menşûr, pêşî kurê şah Riza Palevî yê ketî û piştre Hemîd Îsmaîlûn. ragihand. Menşûra Mahsa ne tenê bû sedema parçebûna hêzên opozisyona Îranê û heta radeyekî mezin têkoşîn û bala gelê Îranê ji hev dûr xist, belkî rasterast bû sedema parçebûna din a Kurdistanê.

Sermayek dijwar li ser peywendiyên partiyên Rojhilatî hat ferzkirin, Komîteya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê parçe bû û mixabin di pêvajoya destpêkê ya vê cudabûnê de 2 pêşmergeyên komelê giyanê xwe li dest dan. Di encamê de krîz û birînek din li bedena qeyrana Kurd û Kurdistanê hat zêdekirin.

Li gel ku partiyên Kurdistanî li vir û wir konferans û semînerên hevbeş li dar xistine, her çend partiyên Kurdistanî bi israr in li ser diyalog û xebata hevbeş, lê di pratîkê de ji ber bûyerên piştî Konferansa George townê, atmosfera ku li ser tevgera neteweyî ya kurd hatiye ferzkirin, ev e. şahidiya cûreyek parçebûnê ye Hevpeymaniyên di nava Kurdistanê de xwedî bingehên gelek lawaz in û îhtimala hilweşandina wan gelek zêde ye. Sedem: Nebûna stratejiyeke zelal a niştimanî û hevbeş di nav hêzên siyasî de û nebûna hêlên sor ên niştimanî. Eşkere bû ku divê Rojhilatê Kurdistanê di hevpeymaniya li gel aliyên din ên Îranê û opozîsyona navendparêz de weke yekitiyeke yekgirtî were dîtin û hevpeymanî yekrêziya niştimanî bixe metirsiyê.

Yek ji serpêhatiyên herî girîng ên Jin Jiyan Azadî ew e ku civaka Kurdistanê civakeke parçebûyî û piralî ye û zêdetir ji yek rê hene ji bo çareseriya pirsgirêkan.

Ti raman bi tena serê xwe nikare bibe alternatîf. Ya ku me dike yek, nirxên netewî, daxwazên netewî yên bilind û azadiya netewî ne. Rêbaz û celebê serketinê dikare cûda bibe.

Lê divê cudahiya bîr û baweriyê nehêle ku Kurdistan weke yekparçeyî bê dîtin û hevalbendên taktîkî zirarê nedin stratejiya netewî. Kûrahiya stratejî ya Rojhilatê Kurdistanê neteweyên bindest ên Îranê ne û her hevpeymaniyek ku pirsa pirneteweyî û neteweya Kurd a Îranê bike, ne tenê têk diçe, belku ziyanê digihîne tevahiya tevgera Rojhilatê Kurdistanê.

Wext e ku em bi hev re bifikirin. Ji bo yekitiya neteweyî pêk were û hemû şiyanên civakê bi kar bînin werin em dest bi diyaloga netewî bikin.

Bi hev re fikirîn ne hêsan e. Gelek ji me jî ne amade ne ku li ser wê bifikirin. Di şûna wê de, em dixwazin bi dûrxistina partiyên din tenê li xwe bifikirin. Encam wê îmhakirina hemû hêzên me be.

Di fîzîkê de, em hîn dikin ku “madde” ji atoman pêk tê. Atom mîlyar carî piçûktir in ku em dikarin di binê mîkroskopê de jî bibînin.

Atom di maddeyê de bi lez tevdigerin û carinan jî li hev dikevin, madde diteqe an jî guherînên kîmyewî çêdibe.

Di derbarê pirsgirêkên civaka kurd de jî heman wêne tê dîtin, lez û kûrahiya pirsgirêkan ew qas e ku kurd bi hêsanî hevdu fam dikin.

Dema ku du maddeyên bi hev re bibin, encam dibe hevketin û ev hevkevtinên di nav civakê de dibin sedem ku civak li hemberî hev raweste û hêz û şiyana me winda bike.

Em kesayet û rêxistinên Kurd çawa dikarin hînî cureyekî çalakî û têkoşînê bibin ku diyalog û têgihîştina me zêde bike? Em çawa dikarin ekolojiya xwe ya siyasî ber bi jîngehek saxlemtir biguherînin? Em çawa dikarin pêşî li veger û jiyana berê bigirin?

Ji bo destpêkirina pêvajoyek weha gava yekem ev e: Reftara mentiqî û bêderfet û pêşxistina şiyana reftar û tevgerê bi awayekî nû û cuda ji berê. Ji ber ku ew rêbaz nehatiye bersivandin. 2. 2. Bêyî ku hewcedariya sûcdarkirin û dadbarkirinê hebe, nermbûnek zêdetir pêş bixin da ku ji hev fêm bikin. Ji bo ku em nebin qurbaniyên hestên ji nişka ve, derfeta analîz û şîrovekirina hev bihêlin.

Divê sermayeya me ya civakî, siyasî, aborî û mirovî ji ya ku em bi destên xwe tune bikin girîngtir û rêzdartir bibin. Awayê ku em difikirin awayê axaftin û îfadeya me diyar dike. Divê em hemû şiyana ku em bi hev re bifikirin pêş bixin û karibin ji nexweşî, pençeşêrê, xweperestî û hevdû şikandinê xilas bibin. Vê nexweşiya giştî hemû hêz û şiyana me ji dest daye.



# Kodên faşîzmê



**N: Kerîm Perwîzî**
**W: Hesen Mukerem**

Vîdyoyek kevn di cîhana medyayî de belav bûye ku tê de Mihemed Elî Recayî, serkomarê wê demê yê rejîma Îslamî ya Tehranê, li pêşiya Ayetullah Mere`işî bi çokda tê û ku dersên birêvebirina welat jê hîn dibe.

Ayetullah Mere`işî yek ji meqamên navdar ên mesebê Şî`e ye û mamostayê piraniya ayetullahên rejîma Îslamî wek Ayetullah Muteherî, Ayetullah Mufetih, Ayetullah Bihiştî û … hwd bûye, di heqîqetê de di sîstema Wilayeta Feqî de stûnên vê rejîmê bûye.

Mere`işî di vê vîdyoyê de çend hevokên kurt ji Recayî re dibêje ku bi awayekî zelal bingeha hizr û siyasetên kolonyalîst û faşîst ên rejîma desthilatdar a Tehranê li hember Kurdistan û Kurdan vedibêje.
Ev çend hevokên kurt siyaseta rejîma Tehranê ya zêdetir ji sed salî li hember Kurdan nîşan dide.
Lewma, em dibêjin zêdetir ji sedsalekê ye, ji ber ku rejîma Pehlewî jî heman siyaset dimeşand û di rastî de Komara Îslamî bûye mîrata tawanên Pehlewî yên li dijî Kurdistanê û berdewamiya heman siyasetê peyrewî dike.

Di hevoka yekem de Ayetullah Mere`işî dibêje li aliyekê me Kendav e û li aliyê din Kurdistan e!
Ev hevok cewhera dîtingeha rejîma Tehranê ya li hember Kurdistanê nîşan dide ku çawa temaşeyî Kurdistanê dike.
Li vir da behsa wê yekê nayê kirin ku Kurdistan jî wek parêzgeh û herêmên din beşek ji Îranê ye an jî xaka me û gelê me ye! Li vir dibêje li aliyekê me Kendav e û li aliyê din Kurdistan!
Di heqîqetê de, vê rejîmê û rejîmên berê, dîtingeha van li hember wiha bûye ku, van Kurdistan weke cihekî biyanî hesabkirine ku ji bo wan çavkaniya gef û metirsiyê ye.

Di heqîqetê de, Ayetullah Mere`işî di vê hevokê de dema ku dibêje ji aliyekê me Kendav e û ji aliyê din Kurdistan e, îşare bi metirsî û gefên li ser rejîma wê demê dike, bi taybetî di serdemê şerê di navbera Îran û Iraqê de Kendav wek deriyeke her fireh a êrîşên cîhana Erebî û Xumeynî, ev wek xizmetkarên emperyalîzmê lêdinihêrî û Kurdistan jî wek dergeha berfireha êrîşên Ereban a girêdayî emperyalîzmê, bi nivîngeha metirsî û gef li ser desthilat û rejîma xwe dihesiband.

Dema ku em li rewşa siyasî û dirûşmên serdema desthilatdariya destpêka hatina ser kar a rejîma Wilayeta Feqîh hûr dibin, dikarin wateya vê hevoka Mere`işî baştir fêm bikin ku dema ku dibêje ji aliyekê me Kurdistan heye, di heqîqetê de dibêje ku Kurdistan çavkaniya gef û metrisiyê ye bo ser rejîma Îslamî û Wilayeta Feqîh! ku heman nêrîna ewlekarî ya rejîma Tehranê li hember Kurdistanê ye.

Di rastî de rejîma Tehranê Kurdistanê ji xwe re weke herêmeke biyanî dibîne, lewma jî xwe di bin metirsiyê de dibîne û bi berdewamî Kurdistan û Kurdan weke çavkaniya metirsiyê û bidawîanîna rejîma xwe dibîne!

Pirsek din a ku di hevokên Ayetullah Mere`işî de bi zelalî xuya dibe, ew e ku dibêje Kurd li çar welatan ên wek: Îran, Tirkiye, Sûriye û Iraqê ne û hemû eşîrên cuda ne, lê xizmên hev in û têkiliyên eşîrî bi hev re hene!
Ev pênaseya sedsalî ya faşîzm û kolonyalîzmê ye ku ji Riza Xan Mîrpence heta Îranşahên niha hinek li opozisyonên rejîma Îslamî de jî tê dîtin heye û peyrewî lê dikin.

Ew bi zelalî dizanin ku Kurd neteweyeke ku di bin desthilatdariya çar welatên Îran, Sûriye, Tirkiye û Iraqê de, lê netewebûna vê înkar dikin! Ji bo vê yekê jî ku xwe ji netewebûnê derbas bikin, dibêjin ku ew êl û tayfeyên cuda ne ku li çar welatan de dijîn, lê ji bo hinceta nasnameya hevpar a van eşîrên cuda dibêjin ku van bi hevre xizmatî hene!
Mîna ku bibêjî hin xizm û eşîr, di bûyerên dîrokî an xwezayî de dibe ji ber lehî an erdhejan ji hev qut bibin û her yek ji wan ketiye welatekî!

Ayetullah Mere`işî wek nûnerê faşîzm û kolonyalîzma sedsalî li Îranê de, bi zelalî dizane ku Kurd yek netewe ye û Kurdistan di nav çar dewletan de hatiye parvekirin, lê xwe li nezanînê dide ji bo jinavbirina nasnameya netewî ya Kurd, pena bo heqaret û sivikkirinê dibe û wek xizmên ji hev du qut bûyî bi nav dike, da ku ji bo van ti mafeke siyasî ji berçav negire.
Ji aliyê din ve ev hevok nîşan dide ku berovajî hinek kesên xwe xapandinî ku wisa hesab dikin ku desthilatdarên Tehranê nizanin Kurd çawa in û dixwazin bi rêya bi qewl medenî û reformxwazan ji desthilatdaran re bidin fêm kirin ku Kurd çi ne. Lê ziman halê sîstema kolonyalîst Ayetullah Mere`işî dibêje, Kurdistan ji bo wan metirisî ye û kurd jî li çar welatan hene, yanî bi zelalî ji pirsa Kurd fêm dikin, lê li gorî bername û pîlanên xwe, di gel Kurdan reftar dikin.

pîlana wan çi ye Ayetullah Mere`işî di beşeke din ya axavtina xwe de behsa bername û pîlana xwe dike û rê nîşanî Recayî dide û dibêje ku divê çi bikin.
Mere`işî dibêje, ji ber ku ew li çar welatan in û hemû jî xizmên hev in! Ji ber vê yekê di gel van bi hestiyarî tevbiger in! Lê di heman demê de, partîzanan perwerde bikin, ji bo deverên wan ên dijwar ên li çiyayan bi partîzanan rû bi rûyî van bibin!

Ev siyaseta pratîkî ya desthilatdarên faşîst ên Tehranê zêdetirî sedsalî ye û heta roja îro jî berdewamî heye!
Mere`işî dibêje di gel van bi hestyarî tevbigerin!

Çima bi hestiyarî? Ne ji ber ku ew neteweyek in û xwedî maf in û divê mafê van bê dayîn! Belkû, ji ber ku ew li çar welatan de hene û hemî xizmên hev in! Yanî ji ber metirsiya ku ew li çar welatan de hene, bi wan re bi hestyarî tevbigerin!
Di heqîqetê de, jî ev ziman halê faşîzma Îranê dizane ku hesta neteweyî ya kurd li perçeyên Kurdistanê yên din de dê bibe sedema piştevaniya kurdan li hev du û ji bo vê ku dijkiryara Kurd li perçên din li peyî tunebe û hesta neteweyî ya Kurdan li dijî rejîma Îranê neyê rêxistinkirin, baştir e ku bi hestyarî di gel van tevbigerin!

Beşek din ji siyaseta pratîkî ya rejîmê li vir ew e dibêje bi nermî tevbigerin ji bo bidestxistina encaman! Nabêje ku ew xelkek in, eger ne netew bin jî dîsa mirov in û heta li gor şerîeta îslamê jî hinek mafên wan hene û mafên van yên îslamî bidin! Di şûna wê de, ew dibêje ku bi nermî tevbigerin da ku encaman bistînin! Encama vê çi ye?
Encam an encama wê ev ye, ji dûrkirina metirsî û gefên ewlehiyê yên li ser rejîmê, ji ber ku rejîma Tehranê her di destpêkê de dibêje, Kurdistan metirsiye û gefeke ewlehî ye. Lewma, jî dibêje ji bo rakirina vê metirsiya ewlehî yan di heqîqetê de jinavbirina gefa Kurdistanê li ser rejîmê, baştir e ku bi nermî di gel wan tevbigerin!
Siyaseta rehenda nerm a rejîma Tehranê, çi di serdemên Pehlewî de û çi jî di serdema Wilayeta Feqîh de, tenê û tenê ji bo têkbirina gefa Kurdistanê an bi gotineke din mehandina kurdan di nava sîstema faşîst a desthilatdar de bûye û encama dilxwaz a Mere`işî û sîstema wî, wiha ye, jinavbirina nasnameya Kurd û jinavbirina çavkaniya metirsiya li ser nizama van e û mehandina van di nav sîstema navendî de ye.
Di dawiyê de jî, dibêje di cihên dijwar de parîzanan perwerde bikin û bi partîzanan rû bi rûyî van bibin!

Siyaseta partîzanî jî ya ku Mere`işî behs dike, di dema Heme Riza Şahê Pehlewî de hatiye avakirin, ku hinek Kurdên girêdayî rejîma Tehranê perwerde kirine û bi partîzan binav kirine û di Kurdistanê de li dijî Kurd radikirin da ku bi destê hêza çekdar a girêdayî rejîma Tehranê, Kurdistanê dagîr û kurd jî serkut bikin!
Navê partîzan jî ji vê yekê hatibû ku rejîma paşayetî kerbê wê li partîzanên fîdakarê xelkê vedibû û siyaseta berdewam a kolonyalîzmê û Îranşehrî pêk dihat li dagîrkirina nav û nasnameya van û di valakirina naveroka van û bi mebestên taybet ên xwe bikar danîn! Di vê serdemê de jî ji ber ku saziya partîzanên fîdakar bixwe navûdng bûn û xelkê behsa van dikir, Heme Riza Şahê Pehlewî bo vê ku navê partîzanan ji van bistîne, navê çekdarên kirêgirtî yên rejîma xwe, bi partîzan binav kir!

Ayetullah Mere`işî û bi rastî jî rejîma Wilayet jî ku mîratgirê rejîma paşayeîtî bûye, ev siyaseta Pehlewî ji bo vî pir guncav bû û ji ber vê yekê ji wan re digot partîzan, di demekê de vê demê rejîma Xumeynî yên ku ji van re digotin Pêşmergê misilman û gelê Kurd jî navek din ji van re digot!
Bi kurtî, rejîma Tehranê tevî vê ku bi çavek ewlehî li Kurdistanê dinêrî û tevî dîtingeha kolonyal û ji holê rakirinê ya bi nisbet Kurdan, li pêxema jinavbirina Kurdan, û bo gihîştin bi encamên rejîmê, an di heqîqetê de bo berdewamiya rejîmê û parastina vê li hilweşandin û mandîkirinê, siyaseta bi nermî li hember Kurdan peyrewî kiriye da ku nasnameya destkird û çewtekariya Tehranê bide mehandin û pûç bike û di naverokê de vala bike û di cihên dijwar de jî yanî li rehendên hişk û giran de, pena biriye bo kirêgirtiyan, çimkî xwastiye şerê Kurd bi Kurd birê ve bibe!

Siyaseta Kurdistanê rast li hember van pîlanên rejîma Tehranê wiha ne, tekezîkirin li ser nasnameya neteweyî, stratejiya hevpişt a Kurdan li her çar parçeyên Kurdistanê, têkoşîna girseyî ya li pêxema gihîştin bi mafên netewî, ne bi erzan firotina mafan, û herwisa pir rengkririna hêla têkoşîn û nasnameya pêşmergayetî li hember bi êrîşên berfireh yên siyasî û hizrî yên faşîzmê.

# Kurdistan, lekeyek li hundirî çavê rejîma Xumeynî de



N: Elî Budaxî
W: Hesen Mukerem



44 salan berî niha, di 28'ê Gelawêja sala 1358'ana Rojî de, di demekê de ku hîn 6 şeş meh li ser rûxandina rejîma padîşayetî û azadiya gelên Îranê derbas ne bûbû, Xumeynî rêberê olî û siyasî yê rejîma nû hilbijartî li Îranê fitwayek li dijî gelê Kurd û tevgera siyasiya Kurd derxist.
Vê fitwayê û kafir îlankirina kurdan li gor biryara meclîsa herî bilind a olî ya desthilatdariyê, bû sedema êrîşa artêşa nû ya Şoreşê û Spaha Pasdaran bo ser Kurdistanê û şerekî bi xwîn li ser neteweya kurd bi metodên cuda bi armanc û pîlanên cuda ku heya niha jî berdewamî heye sepand.

Bi gotineke din, 44 salan piştî fitwaya Xumeynî ya 28 Gelawêjê li dijî Kurdan, Kurdistan her wek vê serdemê lekeyeke li hundrî çavên Komara Îslamî de û 44 salan berxwedan û berevaniya Kurd li hember deshilata reş a dîktator a rejîmê berdewam e.

Herçend dîroka dijminatiya rejîma navendgera li hember Kurdan û pirsa rewa ya van di Îranê de û herwisa dîroka berxwedan û mafxwaziya neteweya Kurd di vê çarçêveya cografiyaya siyasî de, vedigere bi dehan salan beriya wê bûyerê jî, lê ev rêkevt û fitweya Xumenyî, bû bi guherînek li dîroka dijayetî û dijmantiya Komara Îslamiya Îran li hember Kurdan û daxwazên wan yên rewa de. Lê çima?

Mijar ev bû ku Kurdistan piştî şoreşa sala 1357an, xwediyê paşxana zêdetir ji pênc dehkan a têkoşîna sîstematîk bo bidestxistina maf û azadiyên xwe, ezmûna rêveberiya xweseriya demokratîk li Komara Kurdistanê û têkoşîn û amadekariyên berdewam ji bo birêvebirina welat bû.

Di mehên piştî serkeftina şoreşê de jî, avakirina nûnerên gund û bajaran ji bo birêvebirina karûbarên rojane yên gel, xebatên azad û bê asteng ên partiyan li kêleka hev, azadiya çapemenî û weşanan, azadiya çîn û kom û rêxistinên sivîl û vekirina siyaseta bê mînak, mizgîniya nû li azad jiyan û yekîtiya demokratîk ji bo parçeyên din ên Îranê de, mijara bingehîn di vê hevkêşeyê de cudahî û lihevkirinên du dîtingehên cîhanê bû:

Li Kurdistanê gel di rêvebirina civaka xwe de mafê xwe yê neteweyî û xweseriya xwe dixwest, mafek ku bi dehan salan ji bo wê têkoşîn dikirin û xwîn rijandibû.

Lê, serkirdeyên Komara Îslamî di bin dirûşma yekrêziya Îslamî de navendbûn û sepandina desthilata siyasî li ser hemû pêkhateyên welat dixwestin. Gotûbêja siyasî ya Kurdistanê zelal bû:
Lê, rêberên Komara Îslamî, navendgeratî û sepandina desthilata siyasî bi ser hemû pêkhateyên welat dixwast in, ev jî di bin dirûşma yekrêziya Îslamê de. Zimanê siyasî yê Kurdistanê zelal bû:
Demokrasî, azadiya jiyanê, hevgirtina neteweyî, laîktî, piralî, dabînkirina azadiyên medenî û demokratîk, wekheviya mafan, rakirina her cure cudahiyek, pêşxistina çand û hunerê.

Lê ti wateya van nirxan di ferhenga Xumeynî û rejîma wî de tune bû. Lê tenê Îslama siyasî ya bingehîn û avakirina desthilata Wilayeta bêsînûr a Feqîh xwe difkirîn.

Ji ber vê yekê, Komara Îslamî bi paşverotiya xwe ya olî û dijmirovî, ji bo têkbirina ramana pêşverû li Kurdistanê û rêgirtina li belavbûna ramana azadî û mafan ji Kurdistanê bo deverên din ên Îranê;

Di destpêkê de di navbera Kurd û Tirkan de nakokî û alozî çêdikir û dû re jî dest bi şer û êrîşa li ser Kurdistanê kir. Ji ber vê yekê, piştî ku di demsala Bihara 1357an de li Sinê cinayetên Newroza bi xwîn pêk anî, şer anî Nexedê, piştre Pawe û piştre jî fitwaya cîhadî ya Xumeynî ya li dijî tevgera Kurd û tevahiya Kurdistanê berfireh kir ku piştî 44 salan, bilî ji berdewamiya komkujî û wêrankarî û kûr bûna kirîzan ti destkevte din bo van tunebûye.

Berê û piştî vê şerê serbazî yê Komara Îslamî di 44 salên borî de, rejîmê şereke nerm û xapînok berdewam dijî tevgera Kurd li Îranê meşandiye.

Şerê eşkerekirina rastiya tevgera Kurd ji ber sansûr û monopolkirina medyayî ji destpêka şoreşê heta niha; Her wek neteweperest û faşîstên Îranî, tevgera Kurd bi cudaxwaz û girêdayîbûna bi welatên derve tawanbar dikin.

Lê, çar dehkên çîrokên derewîn ên li ser tevgera kurd û gotara wê, tevî xebatên sîstematîk ên bi dehan salan, avakirina bi dehan navendan û xerckirina bi hezaran mîlyar Tûmenê Îranê ji bo van projeyan, pirsa kurd bi şoreşa Jînayê û derkevtina heqîqetên pirsa Kurd bo gelan û pêkhateyên din yên Îranê û ji vî alî de jî bilî riswayî û pûçiya rejîmê ti tiştek din ji van re nemaye.

Piştî 44 salan ji fitwaya Xumeynî ya li dijî gelê Kurd ê misilman, pabendbûna rejîmê bi biryara Ayetullahan re her di cihê xwe de ye û xwandin û siyaseta desthilatê li hember tevgera Kurd her heman e, ti guherînkariyek bi ser nehatiye.

Ev 44 sal in Kurdistanê bi dîtingeha ewlehiyê tê dîtin, tê dûrxistin, li dijî nirxên xwe, komplo ji bo guhertina nasnameya wê ya neteweyî, talankirina serwet û çavkaniyên xwezayî, ciwanên têkoşer û mafxwaz tên girtin û darvekirin, rêberên siyasî yên tevgerê tên terorkirin û partiyên siyasî bi mûşek û dronan dikin armanc; Lê tevî vana jî yê serkevtî her tevgera rewa ya Kurd bûye.

Eger Kurdistan bi boykotkirina referanduma 10ê Xakelêweya sala 1358an a Rojî dengê xwe neda Komara Îslamî, di vî alî de berdêla wê helwesta wêrek û rast a 44 salan dide;


Niha li seranserê Îranê "na"yeke mezin ji vê rejîmê re tê gotin û vê red dikin. Ji ber vê yekê 28ê Gelawêjê wek îspata tunekirina me kurdan û wek bingehek ji bo rewabûn û azadîxwaziya têkoşîn û mafên me beşek ji gotar û bernameya me ya siyasî ye ku em tu carî ji bîr nakin.

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî:”**

- 25ê Gelawêjê xala werçerxanê ye û nîştimanperwer biryarê didin ku refên xwe rêk bixin da ku bi yekgirtî, pirsa netewî bikin bi rêbazek hertimî



**“Omer Balekî”:**

Di rastiyê de yasa organîzatora civakê ye. Bi gotineke din, peymana civakî ya ku di navbera endamên civakê de tê girêdan û tê de erk û mafên kesan tê diyarkirin û her wiha peywendiya di navbera kes û civakê de û berovajî vê yekê bi hikûmetê re diyar dike da ku rêveberiya civakê bi pirsgirêkan re rû bi rû nabe.



**“Mistefa Mewlûdî :”**

“Bi analîzkirina dirûşma stratejîk a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ku li ser dabînkirina mafên neteweyî yên neteweya Kurd li Îraneke demokratîk û federal de ye, em dê bibînin ku bijartina vê dirûşmê bi temamî realîst bûye û heye.



**“Xalid Ezîzî”**

Felsefeya hebûnê ya Hizba Demokrat felsefeyek siyasî ye.

# Gelawêj, xebata berdewam a Kurdan ji bo avakirina kiyaneke Kurdî ye



**N:Eskender Ceiferî**




Heyva Gelawêjê di nav hemû heyvên salê de ji bo Kurdan wateyeke taybet bi xwe re tîne. Gelawêj, tê wateya hewldan ji bo rizgarbûn ji tepisandinê. 25’ê Gelawêjê 78’emîn salvegera avakirina Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê ye. PDKÎ sala 1945’an li ser bingeha rêxistina Komeleya Jiyaneweya Kurd, (J.K) ku sê salan berî wê pêk hatibû, hate avakirin.

Niha jî Rasan bi hemû werz û dansalên xwe, rengê nîştimana Gelawêjê dide welatê me.

Beriya çend salan dema ku Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê basa xebatê dikir, digot em niha di warê rêkxistinî û siyasî de xebatên xwe dimeşînin. Lê vê carê rewş cuda ye û ev çend sal in ew partî baseke cuda dike.

Ev çend sal in ku partiyên Kurdistana Rojhilat dibêjin dibe ku rewş were guhertin û ji ber vê, ew hêzên xwe dibin sînorên Kurdistana Rojhilat.

Piştî Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê, hin partiyên din ên Kurdistana Rojhilat jî hêzên xwe birin sînor.

PDKÎ ku mîratgira Komara Kurdistanê ye, çendîn caran ragihandiye ku eger şer jî çê bibe, ew amade ne. Heya niha bi hezaran şehîd jî di pevçûnên xwe bi Sipaya têrorîstî ya Pasdaran a rêjîma faşîstên Tehranê re pêşkêşî nîştiman kirine û di hember de gelek ziyan jî li Sipayê dane.

Navê projeya vsn çend salan a PDKÎ ku bêhna Gelawêjê lê tê, Rasan yan jî Rabûn e.

Gelawêj tenê ji bo Kurdan nayê wateya xebatê. Gelê Urogoyê yek ji wan gelan e ku di vê heyvê de serxwebûn ji xwe re bi dest xistiye. Ew sala 1825’an ji Birêzîlê cuda bûn. Neteweyeke din ku di vê heyvê de çarenivîsa xwe diyar kir, Bêlaros e ku sala 1991’an ji Yekîtiya Sovyetê veqetiya û serxwebûna xwe ragihand.

Dilê Kurdan jî bi Gelawêjê xweş e û ew ji bo ku bigihin Gelawêjeke azad, xebata xwe didomînin.

Ne PDKÎ û ne jî partiyên din ên Kurdistana Rojhilat, li bendê nîn in ku aliyên derve û welatên din, Îran û Kurdistanê ji bo wan rizgar bikin. Lê ew dizanin ku piştî şoreşa Jînayê helwêsta civaka navdewletî li hemberî Îranê hinek tund e. Li gor wan, desthilata niha ya Amerîkayê wate Joe Bide weke Obama ji Îsraîl û Seûdiyê naxwaze li hemberî Îranê nerm bin belkî wê lidij derkeve.

Hemû partiyên netewegir ên Rojhilat û di nav de jî Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê dibêjin Kurd neteweyek e û Kurdistan jî welatek e û divê partiyên Kurdî li ser bingeha berjewendiya netewî tevbigerin.

Gelawêj, Pûşpera xembar a Dr. Qasimlo jî bîr nake, Xakelêwa Qazî û Payîza Şerefkendî jî ti caran ji bîr nake û lewma jî keç û xortên Kurd ref bi ref tevlî rêza xebatê dibin û li hemberî desthilata tepisandinê wate li dijî gemar û faşîst a Komara Îslamî perwerde dibin.

Êdî ji bilî pêşmergeyên navbajar, carna endamên eşkere ên Partiyên Kurdistana Rojhilat li Herêma Kurdistanê jî, ji bo berxwedana çekdarî li hemberî rêjîma meleyên Tehranê têne rahênan.

PDKÎ ku mîratgira Qazî Mihemed, Dr. Şerefkendî û Dr. Qasimlo ye, sala 2017’an ji bo cara yekemîn navê Pêşmergeyên Navbajêr bi kar anî. Ew jî, ji bilî wan hêzan e ku weke Bazên Zagrosê têne binavkirin û bi têknîkên xwe û bi riftar û kiryarên xwe dişibin vê partiyê û xelk jî, wan, ji vê partiyê cuda nabîne. Tevî ku PDKÎ berpirsyaretiya kiryarên wan nedaye ser xwe, lê Rasan bi hemû demsalên xwe, Pêşmergeyên Navbajêr, Pêşmergeyên Çiya, Bazên Zagrosê û… hemû di xizmeta Gelawêja 78 salan xebat û berxwedanê de ne û di pêxema pêşerojeke geş de ne.

Ne sêdareya Çarçirayê, ne têrora Viyenê, ne têrora Mîkonosê û ne jî şehîdkirina bi hezaran keç û xortên Kurd, nekarî bejna neteweya me li hemberî dagirkar bitewîne. Lê belê xebata wan ji berê germtir û xurttir bûye û bi tîrêjên welatê agir û rojê, sibeh û şevê, dilên ciwanan ji bo evîna welat dinexşîne.

Kevnartirîn partiya Kurdî ku bi awayekî rêkxistinî, di qonaxên cuda de ji serdema Komara Kurdistanê ve li ser piyan sekinî ye, bi xebata veşartî di serdema rêjîma faşîst a Pehlewiyan de û bi xebata eşkere ya bi destê Dr. Qasimlo, nîşan da ku modêrnîzebûn, tenê ev nîn e ku berên xwe bidin welatên rojava û her tişta ku ew bikin, Kurd jî bikin.

Bê guman PDKÎ nîşan daye ku dilê Gelawêj û Gelawêjdostan nahêle û bi dahênanên nû yên weke Rasanê, dê ji bo dabînkirina mafên netewî û dêmokratîk û modêrn ên Kurdan, di kar û xebata xwe de berdewam be.

# 78sal xebat û berxwedan



N: Rostem Cihangîrî

**Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê îsal 78saliya xwe pîroz dike.**

Ew hizba han li 16ê Tebaxa 1945an hemberî 25ê Gelawêja 1324a Rojî li bajêrê Mihabadê li ser bingeha komela J.K.F hat damezrandin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li ser van sê bingehên sereke hat damezrandin, 1-Bidest înana mafên neteweyî yên kurd li Kurdistana Îranê, 2-Damezrandina sîstemeke Demokratîk li Şiklê komarî de, ku li hundr de demokrasî bi wateya tevaw bê cî bi cî kirin 3- Damezrana edaleta Civakî, ku hemû kes mafên wekhev hebin, ti kes li serwey yasayê nebin hemû kes li hemberî yasaya wê komarê berpirsyar bin.

Li wê devrana dûr û dirêj a dîrokekî de tijî serwerî û berxwedan û qehremantî û pir destkevtên dîrokî ji bo xwe û gelê xwe re bidest ainiye.

Ev Hizba yekem partiya siyasî û demokrat û azadîxawaz bû li dîroka bizava rizgarixwaziya gelê kurd de ku hat damezrandin, û bi damezrana wê hizbê rêberî û serkirdayetiya siyasî ya şoreşa rizgarîxwazî ya gelê mafxwaz yê kurd li destê tak û serok hoz an serok eşîran yanî li dest rêberekî aynî derket û ket destê hizbeke siyasî ku rêberiyekî hilbijartî yê gelê xwe û bername stiratîjîka wê partiyê eyan bû, programa wê ya siyasî civakî û çandî û êkonomî her hemû hat nivîsandin û li kongira yekem a damezrana Hizba Demokrat a Kurdistan de kete berdestê beşdarên kongirê, û hat pesend kirin, bû yekem car rêberatiya wê Hizbê bidestê pişkdarên wê kungirê hatin hilbijartin û bi têkray dengên beşdarên kongirê Pêşewa Qazî Mihemed bi serokê giştiyê partiyê hat hilbijartin.

Vê partiyê li stiratîjîka xwe de mafê diyarî kirina çarenivîsa gelê Kurd diyarî kir, ku dibe Kurd wek hemû Netewên ser rûyê erdê mafê pêkînana kiyana xwe û hebe.

Hizbê ev yeka gotiye û qewil daye cîbicî kiriye, yan heta niha jî li gel be bawerî pê heye li van pirensîpan vêde nedaye.

Li zirûfa paş şerê cîhanî yê duyem ku pişkek berçav li Kurdistanî bihatina nav hêzên Yeketiya Sovyet li bakurê rojhelatê kurdistanê û hatina hêzên Birîtaniya li başûrê Îranê hetanî başûrê Kurdistana Rojhilata Navîn, navenda Kurdistanê weke Bokan Mihabad û Nexede û hetanî pareke zor li Bakurê Kurdistana rojhilat vala bûn û li hem dewleta Îranê û hem mitefiqîn li Azerbaycanê, demezrandina hikumeteke demokratîk hat damezirandin. Carna Kurdiatan jî beşeke li wê hikumata xwe didan hesab kirin.

Pêşewa Qazîmihemed Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê, ew rêya red kir, û ragehand ku Kurd û Kurdistan Miletekî cuda û zimanê wê, axa wê ya cuda heye. Kultûra xwe ya xasmanî edetên wê hemû tev netewên din yên navçê cudahî heye, dema ku wisa bû mafê wê miletiye ku çarenivîsa xwe eyar bike, û ti kesên din maf tunînin ku li van qiraran bidin.

Pêşewa ragihand ku emê paş mişûr kirin tev mezin û zanayên Kurd dê helwesta xwe rabigihînin.

Pêşewa vegeriya bo Kurdistanê û li Çarçiraya Mihabadê tevî zana û kesayetiyên Kurdistanê ew daxwazkara Azerbaycaniyan û bixasmanî yeketiya Sovyeta wî zemanî bas kir û ji van re got ku niha ez hatime cem we ka hûn çi dibêjin, wiha bû ku hemî rêdîn sipî, zana û kesayetiyên Kurd ragihandin ku dibe Kurdan dewleta xwe hebe û xaka xwe biparêze, û navê wê xakê Kurdistan e. Em tevlî dewleteke din nabin, û ragihandin eger qirar be em bibin bi parek li dewleta Azerbaycanê wiha ti cudahiyek di gel vê yekê nake ku em di bin destê dewleta Farsan li Tehranê bûn, hertim dihatin tepeser kirin, dagîrkirin, ji ber vê yekê, em wê dexwaza van red dikin, û ji Pêşewa re ragihandin ku tu rêber û pêşewayê me Kurdanî, dibe pêşengiya me Kurdan bikî.

Pêşewa Qazîmihemed bersiva Azerbaycanê û bixasmanî Yekîtiya Sovyetê da û ragihand ku ez bi nûneratiya gelê kurd, vê pêşniyara we red dikim, û emê dewleta Kurdistanê damezrînin, weke du dewletan û cîranên baş bihevre hevkar û dost û hevpeyman bin.

Piştî wê bersiva Pêşewa bo herdu aliyên Azerî û Sovyetê, roja 2ê Rêbendanê li bajêrê Mihabadê li meydana Çarçiraya wî bajarî bi girseyeke mezin a gelê Kurd li hemû parçên Kurdistanê ,Komara Kurdistan ragihand, û her li wê girseyê de bi dengê eşkere gel Pêşewa Qazîmihemed bi Serkomarê Kurdan diyarî kirin.

Ew Hizba destkevtên mezin û dîrokî bi pêkanîna Komara Kurdistanê bidest xistin wiha ne, Ala Kurdistanê, Spaha Milî ya Kurdistanê, navê pîroz yê Pêşmerge bo şerkerên Kurd, xwandin û nivîsîn li dibistanan de bi Kurdî, zimanê Kurdî kire zimanê fermî yê îdarên hikumetê li Kurdistanê, li damezrana Hizba Demokrat heta niha nivîsin û xwandin li nava dezgeh û organanên Hizbê de berdewam e û ev yeka li nava gel de jî nivîsîn û xwandin bi Kurdîyek saf û bêgerd gelek pêşketiye. Çap kirina rojname û kovarên Kurdî, pêk anîna civakên jinan û ciwanan, pêkanîna dîplomasî tev derdorên xwe û partiyên Îranî û kurdî, bixasmanî pêwendiyên xwe bi zilhêzên wê demê yên weke Yekîtiya Sovyet û dewletên din re.

Bi wî awayî Kurd di wê serdemê de navûdeng derxist. Li hember zilhêzên navdewletî de Kurd û Kurdistan dengê wê hat bihîstin, û tevî wê yekê ku berjewendiyên zilhêzan tev xastên Kurdistanê li hev nedigirtin, ev yek bû ku ev alîgirê mafên Kurdan nebûn.

Her ew yeka bû ku bihevre hevgirtin dest bidestê hev hêrişî ser herdu dewletên Azerî û Kurd kirin herdu hikumet hiloşandin, lê Kurdistan û Hizba wê bi serokê xwe teslîmê wê xastên van nebûn, Pêşewa dadgeha rejîma Şahenşahî kire meydana berevanîkirin li mafê Kurd û Kurdistanê, her ji ber vê yekê ye ku serkomarê Kurd tevî du hevalên xwe hatin îdam Kirin.

Paş Komarê Hizba Demokrat û xortên Pêşewa xebata xwe ya siyasî û hinek caran çekdarî domandin, li wê xebatê de heta serhildana gelên li dijî rejîma Şahenşahî li Salên 1979an ew şoreş bi yek dengiya gelên Îranê bi ser rejîma padşahî de serkevt. Hatina serkar a Komara Îslamî zevt kirina maf û azadiyên gelên bindest ên Îranê, Hizba Demokrat destê dyalogê bo wê rejîmê dirêj kir, lê rejîma meleyan bi hirşên eskerî tang û tûpan bersiv dan.

Seba wê hindê Hizba Demokrat ragihand ku pirsa Kurdistanê pirseke siyasî û milîye û dikarin wê li rêyên dyalogê çareser bikin û em û gelê Kurd amaden e bû çareseriya siyasî û aştiyan e, lê her wek diyar bû karbidestên nû yên desthilatdarên Îranê qirar û biryarên xwe dabûn ku bi şer û kuştinan pirsa Kurdistanê vemirînin, wiha bû ku gelê Kurd biryara berxwedanê da û şerê seranserî li Kurdistanê dest pê kir.

Hizba Demokrat bi temenê xwe yê 78salî, tûşî gelek karesatên mezin bûye, hilûşîna Komara Kurdistanê, şehîd kirina Pêşewa Qazîmihemed û hevalên wî, dest berdana bi hezaran endam û kadrên rêberî paşî hilûşîna Komarê, şehîd ketina bi deyan serkirde û kadrên rêberî li salên 1346 û 47an berامber 1967-68an şehîd ketin bidestê artêşa şahenşahî.

Piştire komkujiyên mezin û şehîd ketina rêberên Hizbê, şehîdbûna Dr.Ebdulrehman Qasimlo sekreterê giştî yê Hizba Demokrat tevî çend hevalên xwe, piştire li demeke gelek kêm de yanî sê salan de derbeyek mezin a din li Hizbê kevt, ew jî şihadeta şehîd Dr.Mihemed Sadiq Şerefkendî cêhgirê şehîd Dr.Qasimlo tevî çend hevalên wî yên din bidestê terora Komara Îslamî ku şehîd bûn.

Lê, her wek çavnhêrî dihatkirin vê Hizbê birînên gelek mezin û bijan hildigirt, lê neket, şehîd Dr.Qasimlo li pêxema Hizbê û bi ezmûnên dîroka şoresên Kurdistanê ku dijimin hertim hewla van ew bû ku serê şoreşê lê bidin û bi wê awayî şoreşê vemirînin.

Ew yeka bo şehîd Dr.Qasimlo gelek eyan û rohn bû, li ber wê hindê fikira rêberiya bikom anî nava Hizba xwe û kar û xebateke pir mezin birêve bir, heta asta têgihîştina bedena Hizbê û kadroyên rêberiya Hizbê bên wê asta herî bilind, da ku li hember her kosp û karesatên mezin de xwe ragir bin û bawerî bixwe û gelê xwe bînin.

Û teslîmê wan karesatan nebin, belkû dibe bihevre mişûrê bikin hevkariya hev bikin, pişta hev bigirin, da ku di tengasiyan de xwe winda nekin.

Bi hevre bin hûn ser bikevin, ya ku îro rojê em dibînin û bixwe li hundrî ne û piştî van hemû karesatan û şehîd ketina bidehan rêber û şikanên mezin, û li hember derketina hêrişên hovane yên ser gelê Kurd, dîsan li hember bidehan pîlanênên neyaran serkevtin bidest aniye, û gelek caran bi quweta dost û alîgiran, bi piştevaniya dilgermî ya bi gelê xwe re karîne van şikanan bikin derfet û serkevtinê bo xwe misoger bike û li meydanê bimîne.

Niha êdî fikir, raman û siyaseta rast û drust û şiroveyên rast xwandina bûyer û gurînên cîhan û navçê, xwe amade kirina pêş wext, pêşiya şîpelên neyaran girtiye, êdî bûye Hizbeke qal, cihê baweriya gelê xwe bigire gelên Îranê bixasmanî gelê Kurdistan li her çar parçên Kurdistanê, ev Hizba heta gihîştin bi armancên xwe, gihîştina gelê Kurd bi azadî û serbestî ya Kurdistanê her li meydanê de dê bimîne û berevaniyê li kirameta gelê xwe bike.

**Bi hilkefta 25ê Gelawêjê serê xwe li hemberî kar û têkoşîna wê Hizbê û şehîdên serbilind ên rêya azadîyê diçemînim.**

**Pîroz û geştir be Agirê 25ê Gelawêjê sersala Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê.**

**Silav li xebatkarên demokrat û pêşmergên qehreman**

# Pirsa jinê li hember pirsa mêrsalariyê



**N: Vênûs Fayq**
**W: Hesen Mukerem**

Lê belê sernavên “pirsa jinê” û “pirsgirêka jinê” ji destpêkê ve bi xeletî hatine bikaranîn û dibe ku ev têgîn bi zanebûn ji bo serdestiya pênaseya “jinbûnê” li ser “mirovatiyê” hatibe avakirin. Di heqîqetê de pirsek bi navê pirsa jinê tuneye, lê belê pirsek bi navê “zilametî” heye ku li ser esasê ol û kultûrê ye, li ser bê nirxkirina mirovbûna jinê û di çarçoveya pênaseya jinê de teşekirina wê heye.

Zilamsalarî mîrateyek çandî ya civakî ye ji bo her du zayendan û ketiye nav axaftin û ramanê û pirsgirêk jî ew e ku ramana jinê di nav “ramana komê” de betal bûye û bawerî bi perwerdehiya vê aniye û wê ji nû ve hilberîn, êdî çawan zilamên fîmînîst hene, jinên zilamsalar jî hene û hinek dema jî jêra piropagenda dikin.

Perwerdehiya kultûrî û olî ya ku ew qas metirsîdar e, wisa li jinê kiriye ku di dilê xwe de bawer bike ku ew yek pileyî di bin zilaman de ye, baweriya xwe bi xwe winda kiriye û di jiyana xwe de daye zilam ku wan bi rê ve bibe û rênîşanderê wê be.

Beriya her tiştî divê jin xwe li hev bike, xwe weke mirov bide naskirin û bixwe xwe pênase bike, ev yeka jî hewce ye ku hişmendiya komî ji holê bê rakirin û avakirina kultûrek din û têgehek din li derveyê olê li têgeha mirovbûnê ye, çimkî hemû têgihîştin bo tevahiya dêroka olan vê yekê didin îspatkirin ku têgihîştineke din a têgeha “mirovahiyê” ya li derveyî olê, îspat bike ku ti olî nekariye mirovbûna jinê wekhev bi mirovatiya zilam di nav teskên xwe de îspat bike.

Di civaka me de, ne her kes di heman çemberê de dijîn, belkû di paşxaneya komê de di navbera zilam û jinê de têkiliyek pîramîd ev bihevre girêdane. Jixwe, ji du mexlûqên ku di bin heman banî de bêyî heman asta mirovatiyê bijîn, û heman pileya mirovbûna van tunebe.



Di civakên ku li ser navê ol û kultûrê piropangende bo têkiliyên malbatî û jiyana hevpar dikin, zilam li cîhanekê dijîn û jin li cîhanek din, kur perwerdehiyek dibînin û keç jî yekî din dibînin. Şimûn Dobovwar dibêje: “Jin ku jidayêk dibe mirove, lê bi perwerdehiyê dikin bi jin. Bi zorê wê li desthilatdariyê derdixin û “jinîtî” dibe bi pênaseyek cuda li pênaseya mirovbûnê”.
Di vê navberê de pirsa jinê ya di civakê de di dîrokê de di çarçoveya têgîna desthilatdariyê de hatiye xwendin, jin weke bindest û zilam jî weke serdest hatiye pênasekirin.

Di demekê de ku jinê ne hewcehî bi desthilatê ye, hewcehî bi vê yekê ye ku di çarçoveya mirovatiyê de were pênase kirin, lê felsefeya nêrîna ci vakê pirsgirêk e. Ne tenê li derheq “jin”ê de, di civaka me de feraseta “desthilatdariyê” ye belkû hemû aliyên din ên civakê wêran kiriye.
Di civakên me û yên hev şêweyên me de çemberek mirovî ji bo jiyana bi hev re ya hemû civakê bê cudahî nîne, belkû, civak li gorî pîramîdên desthilatdariyê di nav çend çemberan de hatiye parvekirin.
Her hewildanek ji bo guhertina civakê û şikandina çand û baweriyên paşverû yên li derve yan jî dûrî têkîliyên aloz ên di navbera jin û zilaman de bi ser nakeve, heya ku herdu jî neyên kirin. Dema ku wisa ye wirda mijar guherînê di careserkirina têkliyên di navbera jin û zilam de çavkanî werdigire. Yanî ji bo destpêkirina guhertina civakê divê têkiliya di navbera jin û zilam de bi awayekî însanî bê avakirin.

Niha hewcehiya me bi perwerdehiyeke din heye, bêyî ku têkiliya me bi femînîzmê û olê re hebe, ol çiqasî jinê ji mirovahiyê dûr bixe, femînîst jî ewqas jinê dike jin û wan ji pênaseyeke mirovî derdixe. Hewcehiya me bi perwerdeyeke bêalî heye ku keçan weke mirov pênase bike, ne jin. Di dawiyê de, di nav gotina ku her zilamek xwediyê tiştekî mê ye, û her jinek xwediyê tiştekî mêranî ye, divê hişmendiya mirovahiyê bê serê.

# Diyardeya koçberiyê îro pirsgirêka Îranê ye

**N: Nîştiman Urmiye**
**W: Hesen Mukerem**

Îro ji her demê zêdetir diyardeya koçberiyê siya xwe li ser Îranê de pan kiriye, li vê pirsgirêkê dinêrim, ez paşerojê li vê xakê di tarîtî, îzolasyon û tenêtiyê de dibînim.

Her diyardeyeke ku bêhna zanînê jê bê, ciwan çarenivîsa xwe ji vê xakê vediqetîne û rêya veqetîna ji welat digre berahîka xwe, ji ber ku di vê rêya pêç li nav pêçê ya bêdawî û nediyar a vê Îranê (Îrana îroyîn) de paşerojeke tirsnak ji xwe re resmandiye. Û ji vê tarîtiyê her roj qada vê pirsgirêkê berfirehtir dike û komên ciwan, xwendavan û rewşenbîr ji bilî koçberiyê tu din nabînin.
Îrana îroyîn veguheriye bi rêyeke teng ku daxwaz û armancên nifşên îroyîn di vê korîdora zirav de rê bo çûna ti aliyekê nabînin.

Bi gotineke din, ciwanên Îrana îroyîn di navbera koçberiyê û bijardeyên wekî bêkarî, tepeserkirina bîr û ramanan û azadiyên medenî û gotinê û … hwd de heman koçberiyê hildibijêrin. Ji ber ku Îrana îroyîn ji bo nifşa îro ne xwediyê kûrahiya stratejî ye, mezintirîn girtîgeh e li hember daxwazên nifşa îroyîn.

Li Îrana îroyîn qalîteya zanîngehê ketiye bin pirsînê, kêmî jê pêş ketiye, di heqîqetê de zanîngeh ji avakirina asta zanist, pratîk û zanînê zêdetir bûye cihê avakirina dereceyan. Ji ber vê yekê, derbasbûna asta xwendinê di asta navneteweyî de cihê nîqaşê ye.

Di Îrana îroyîn de îro em bi dijwarî bi pirsgirêka nebûna kar an jî karê domdar û kêmbûna mûçeyên karker û kedkaran re rûbirû ne, ku ev girûp ber bi xizaniyê ve biriye.

Li Îrana îroyîn hema bêje mafê jinan tine nefesê hilmijin û mafên herî bingehîn ên jinan tên binpêkirin û berevanîkirin ji wan dibe sedema heps û tepeseriyê. Li Îrana îroyîn pirsgirêkên jîngehê ber bi asoyê ve zêde bûne û ekosîstema Îranê di nava wêranbûnê de ye, mînaka eşkere ya wê zuwabûna mêrg, rûbar û golan e û mînaka wê ya berçav jî zuwabûna gola Urmiyê ye. Ev hemû pirsgirêkên jîngehê bandoreke wêranker li ser çerxa jiyanê dikin û sedema sereke ya vê bêserûberî û kêrnehatîbûna dewlet û hikûmet e.
Li Îrana îroyîn nirxa diravê neteweyî li cîhanê tu qîmeta vê nemaye û en flasyona piştşikêner, Îran kiriye wek pîrejineke çemyayî. Li Îrana îroyîn cotkar koma herî xisar dîtiye û hema bêje ti piştgiriyek jê re nemaye û tişta ku jê re maye nirxa kêm a berhemên wî ye.
Îro li Îranê, kesên malnişînkirî yên xwediyê moçeyên malinşînkirî yên kêm, jiyaneke dijwar derbas dikin û ji ber ku di temenê pîrbûnê de derbas dibin, û her roj meydan bi van pisgirêkên westiyayî yê jiyan bo qada vê komê tengtir dibe.

Ji ber vê yekê, ew çend mînakên ku min behs kirin, beşeke biçûk ji pirsgirêkên gelên Îranê ne, ev hemû faktor dest danê hev du û ji dilê van pirsgirêkan koçberî derdikeve holê û rêya herî dijwar a mumkin hildibijêrin, ku piraniya van komên koçberan ji rêyên qaçaxçîtiyê jiyana xwe dixin metrisiyê da ku çareyekê bo rewşa jiyan û paşeroja xwe bibînin.

# Partîyek mafxwaz yan nasnamexwaz?



**N: Elî Munezemî**

Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê -PDKÎ- 78 salan berê li ser xîmê «Komeleya Jîyaneweya Kurd» hate damezirandin û heta îrorojê rolek mezin di xebara rizgarîxwazîya kurdan bi giştî û ya kurdên Rojhelatê Kurdistanê de bi xasmanî dilîze.

Lê, gelo ew parta han partîyek mafxwaze, nasnamexwaz û yan jî herduyê wan?

Xebata Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê bo herikandina xelkê kurd di pêxema avakirina hikûmeta serbixwe a Kurdistanê ku bi damezirandina Komara Kurdistanê rengweda, li hêlekê xebatek bo nasnameya sîyasî a neteweya kurd bû û li hêla din, xebatek mafxwazane bû di çarçoveya zagonên navnetewî bo maf û azadîya xelkê kurd û wekhevîya neteweya kurd û hemû neteweyên din.

Xebata PDKÎ'ê bo nasnameya netewî bi sedema hindê bû ku kurd ji ber perçebûna welatê xwe, nasnameya wan jî hatibû perçekirin û dagîrkeran ne tenê tu buha nedidan nasnameya kurdî û ew bi fermî nasnedikirin, belkî herwiha pirrengî û nêrînferqî jî tehemol nedikirin û civak bi awayekê organîze kiribûn ku kurdan bi tak û bi kom, xwe yê hundirîn li hember nêrîna civaka serdest a dagîrkeran de cihê hîs dikirin û li pey nasnameya xwe ya rastîn de bûn.

Ew hîsa ku kurdan hebû, gava ku ew li pey xwe ê rastîn bûn, li pişt hemû ew laye ên ku civaka dagîrkeran li ser de sepandibûn, kurd teşwîq dikir ku li hember dagîrkeran de serî rake û ew kêrhatiya xwezayî ku cewhera kurdan pêk dianî û li hundirê xwe de nasnameya xwe ya rastîn fam dikirin, ew gihîştandibûn wê bawerîyê ku azadîya xwe li derveyî zagon û normên dagîrkeran dûreçonê bo bikin û cehda tecribekirina wê bidin.

Bes damezirandina PDKÎ'ê li ber wê sedemê bû ku dagîrkeran nekarîbûn pergalek demokratîk damezirînin ku mafên gerdûnî, keramet û şexsîyeta kurdan biparêzin.

Lewra Damezirandina PDKÎ bersivek xwezayî, bê xwe lê ladan û dîrokî a kurdan bû bo wan hemû neheqîyan ku li aliyê dijminan ve derheq kurdan hatibûn kirin.

Hindik kes di navbera sîyaseta nasnameyî ku cehd û têkoşîneke azadîxwazane a neteweyên bindest e û îdeolojîyên tundajo û şovînîstî ferq û cudahîyê dananên û bi yek berçavkê bera xwe didinê.

Lê sîyasetên nasnameparêz ku maf û azadîyê, sîyasetên «meriv-senter»in ku maf û buhaya xwezayî a merivan dikin bingeh bo kompozîsyona wan sîyasetan.

PDKÎ'ê di heyamê temenê xwe de li gor zirûf û şert û mercên Kurdistanê, herêmî û cîhanî hindek caran guhertin li ser hindek li sîyasetên xwe de anîye.

Bo nimûne li damezirandina dewleteke serbixwe li Kurdistanê de, hindek caran armanca xwe guhertiye bo bidestve anîna xudmuxtarî an federalîzmê di Rojhelatê Kurdistanê de, lê cewher û kakila daxwazên xwe ku girêdayî bi nasname û mafên kurdan e, parastîye.

Gava ku tê gotin PDKÎ partîyek mafxwaz û nasnamexwaz e, tê wê wateyê ku dixwaze kurd wek xwe – wek netewe – bi fermî bê naskirin û wek parek li neteweyên fars, ereb yan turk neyê hesibandin û buha û nirxa kurdan wek netewe bê zanîn, hurmet jêre were girtin û tam kurd goreyî ku xwe pênasa xwe dike, were qebûlkirin.

Gava nasnama kurdan bi fermî were qebûlkirin, hingê goreyî wê kategorîyê mafê wan jî yê bê qebûlkirin. Sîyaseta nasnamexwazîya PDKÎ'ê girêdayî bi hêmanên netewesazîya kurdî ve ye.

Kurd nasnameya xwe li pêş hemû tiştî de li ax û zimanê xwe werdigre û ewê yekê bi çand, dîrok û hîsên hevpar mayinde û bi hêz dike.

Pêdagirîya Dr. Şerefkendî li ser nasnamexwazîya PDKÎ'ê piştî hiloşîyana Yêketîya komarên Sovîyetê destnîşankirina hêla hizrî û bawerîyên wê partîyê bû ku carek din li serdema "Şoreşa Jîna"yê de li Rojhelatê Kurdistanê de reng weda. Ewê reng wedanê li gotinên bavê şehîd "Komar Uftade" de dilê her kurdeke welatparêz hejand gava ku got: " Ew li 25ê gelawêjê de ji dayik bû.

Ji ber wê yekê min navê wî kir Komar." Ew gotinane nirxandinên bi hêz in bo ku nîşan bide çima xelkê kurd li PDKÎ'ê hez dike û bandora wê li ser nasnameya netewî û xebata mafxwazane çend e.

Neteweya kurd bo berdewamîya PDKÎ'ê li xebat û berxwedanê nirxên mezin dane.

Em jî wek endam û alîgirên PDKÎ'ê wê yekê dibînin û ewê yekê bi qedr û qîmet dihesibînin û dizanin ku bêy piştevanîya xelkê, xebat jî nayê kirin. Neteweya kurd şikest û serkevtina wê partîyê bi ya xwe dizane û bi rastî jî xelkê me xwedîyê rastîn yê wê ne.

Dûr neketina PDKÎ'ê li hêla neteweyî, herwisa ew partî kiriye cihê rêz û hurmeta kurdan li hemû perçeyên Kurdistanê de.

Li pêşerojê de jî pêdivîye ku ew hêl were parastin, xurtikirin û berfirehkirin.

Bilindkirina asta wê nirxê, xurtkirina PDKÎ'ê û xebata azadîxwazane, nasnama kurdî û dadperwerîyê ye û serkeftina wê xebatê jî yê kartêkerîyek mezin hebe li ser rewşa azadî û aşitîyê di hemû Rojhelata Navîn de.

Carek din em 78'min rojbûna PDKÎ'ê li hemû neteweya kurd pîroz dikin û daxwaza serkevtinê jêre dixwazin.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Mehabad; Armanc Xeste ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat girtin

Sibeha roja Çarşemî 25`ê Gelawêjê, welatiyekî Kurd bi navê “Armanc Xeste” kurê Ehmed xelkê bajarê Gogtepe û rûniştiyê Mehabadê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat girtin û bo cihekî nediyar hat veguhastin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, hêzên ewlehiyê bêyî ku belgeya dadgehê nîşan bidin, ev welatiyê han di mala wî ya şexsî de girtine.

Heta dema belav bûna vê nûçeyê, derbarê sedema girtin, tawan û rewşa Amanc de ti zanyariyek berfireh ber dest tuneye.

Di vê derbarê de, sibeha roja Çarşemî 25ê Gelawêjê, 3 welatiyên Kurd yên bi navên “Şêrko Nesîrî”, “Hedayet Xeste” kurê Elî û “Eşkan Resûlî” kurê Elî xelkê bajarê Gogtepe yê Mehabadê, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin û hêzên ewlehiyê ev birin cihekî nediyar.

## Li Kamiyaranê 2 bira ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatin girtin

Du welatiyên Kurd yên bi navên “Hisam Keremî” û “Sîrvan Keremî” zarokên Îbrahîm û xelkê gundê “Çirosane” a ser bi Kamiyaranê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatin girtin û Sîrvan Keremî piştî çar rojan ji binçavkirinê hat azadkirin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, 4 rojan berê Sîrvan Keremî bêyî nîşandana belgeya dadgehê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû girtin û roja Şemiyê 28ê Gelawêjê hat berdan.

Vê çavkaniya haydar her wiha got: Sîrvan Keremî li girtîgehê de ji aliyê hêzên ewlehiyê ve bi tundî hatiye îşkencekirin.

Vê çavkaniya haydar diyar kir: Piştî azadkirina Sîrvan Keremî, birayê wî Hisam Keremî ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatiye girtin û ti agahî derbarê rewşa wî de nînin.

Sîrvan û Hisam Keremî pismamê Burhan Keremî ji qurbaniyên serhildana şoreşgerî ya Jin, Jiyan, Azadî ne ku di 25’ê Xakelêweya sala 1401’an de li Kamiyaranê ji ber guleresandina hêzên serkutkar jiyana xwe ji dest daye.

Heta dema belav bûna vê nûçeyê, ti zanyariyek derbarê sedema girtin û tohmetbarkirin van her du birayan de tine.

## Li Merîwan û Ciwanroyê 2 welatiyên Kurd ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatin girtin

Du welatiyên Kurd bi navên “Zana Pervane” xelkê Merîwanê û “Mo`în Feqîhî” xelkê Ciwanroyê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatin girtin û bo cihekî nediyar hatin veguhastin.

Li gor çavkaniyek agehdar, roja Şemî 28ê Gelawêjê, Zana Pervane yê xelkê Merîwanê bêyî belgeya dadgehê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatiye girtin û ti zanyariyên berfireh derbarê rewşa wî de nînin.

Ji aliyekê din ve roja Înê 27ê Gelawêjê, Mo`în Feqîhî temen 25 salî û xelkê Ciwanroyê, bêyî belgeya dadgehê li mala xwe de ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat girtin û bo cihekî nediyar hat veguhastin.

Heya dema belavkirina vê nûçeyê, derbarê sedema girtin û tohmetbarkirina van her du welatiyan de ti zanyariyên berfireh nehatine bidestxistin.

## Xedîce Mehdîpûr girtiya siyasî ya berê ji bo derbaskirina hukmê 3 meh û 1 rojî bo girtîgeha Îlamê hat şandin

Roja Şemî berwar 28’ê Gelawêjê, Xedîce Mehdîpûr girtiya siyasî ya berê ku ji aliyê şaxê 103’ê dadgeha tawanan a Îlamê ve bi sê meh û rojekê hepsê hatibû mehkûmkirin, ji bo cîbicîkirina vê hukmê çû girtîgeha Îlamê.

Mehdîpûr 31’ê Banemera îsal ji aliyê şaxê 103’ê Dadgeha Cezayên Giran a Îlamê bi serokatiya dadwer Elîreza Hemtîzade bi tohmeta “belavkirina derewên di qada înternetê de mebesta xerabkirina hişê gel, bi 3 meh û rojek girtîgehê” hat mehkûmkirin. ”

Xedîce Mehdîpûr di 19’ê Tîrmehê de ji bo belgenameya cezayê girtîgehê wergirtibû.

Ev girtiya siyasî di Rezbera sala 1400î de hatibû girtin û piştre 20 meh cezayê girtîgehê lê hatibû birîn. Ew di dawiya Reşema 1401an de, piştî derxistina biryara efûyê hatibû berdan.

Berê jî wê derbasiya girtin û mehkûmkirinê hebûye.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (452)

## Wêneyên xwenîşandanên diyaspora li dijî serkutkariyên rejîma Îranê











